# Sed Salên Pirrengiyê

## Nerîna Hevbeş

## Sedsaliya damezrandina Bajarê

## Qamişlo / Qamishlî / Zalîn

## Sed Salên Pirrengiyê

## Nerîna Hevbeş

## Sedsaliya damezrandina Bajarê Qamişlo / Qamishlî / Zalîn

Bajarê Qamişlo/El-Qamişlî/Zalîn di 20ê Tebaxa 2026an de dikeve 100 saliya xwe bîranîna sedsalek ji veguherînên dîrokî, civakî, çandî û siyasî bi xwe re hildigire.

Sedsaliya vî bajarî ne tenê kêliyek sembolîk e, lê di heman demê de derfetek e ji bo ji nû ve vedîtina rewan û nasnameya bêhempa ya bajêre, Ji bo ku niştecihên Bajar bikaribin pêşerojek dadmendtir, nasraw û bi hev re bijîn, di heyama dîroka wê ya dirêj a paşguhkirinê û nakokiyên têkildar ên ku bandor li ser tevna wê ya civakî û çandî kirine, pîrozkirina sedsaliya bajêr gavek e ber bi vegerandina wê ji serdemên dirêj ên zordariyê û vegerandina xwedîtiyê bo xelkê wê.

Em Qamişlo wekî cihekî dibînin ku pirrengiya zimanî, çandî, olî, siyasî û civakî dihewîne. Ew mozayîkeke civakî ye ku li herêmê bêhempa ye. Li vir Suryanên Asûrî, Kildanî, Kurd, Ermenî, Ereb, Cihû û Çerkez dijiyan. Zimanên Kurdî, Suryanî, Erebî, Îbranî û Ermenî li vir bi hev re dijiyan, û ol û mezheb bi hev re dijiyan, di nav de Misilman, Êzîdî, Xiristiyan û Cihû.

Ev pirrengî qet ne mijarek demkî an tesadufî bû, lê belê bingeha avahîsaziyê ya bajêr û cewhera pirrengiya wê ye ku ev nerîn ji bo pîrozkirina vê yekê ye.

Em dixwazin ku Qamîşlo bibe navendek ji bo diyaloga civakî, cihekî ji bo hevdîtina pirrengiya çandî û zimanî, modelek ji bo dadmendî û hemûparvekirinê, û laboratoreke zindî ku nîşan dide ku jiyana hevbeş ne xewnek dûr e, lê pratîkek rojane ya gengaz e. Em dixwazin ku ew bibe bajarekî dostê jîngehê, piştî salên

şer û paşguhkirinê têkiliya xwe bi av, ax û hewaya xwe re sererast bike. Bajarekî paqij û kesk ku rûmeta jiyanê dixe navenda pêşîniyên xwe.

Sedsaliya Qamişlo/Qamişlî/Zalîn derfetek e ji bo ji nû ve avakirina vegotineke kolektîf a pirdeng ku rêzgirtina ji bo hemî pêkhateyên xwe bê dûrxistinê vedigerîne û rola xwe wekî pirek di navbera rabirdûyeke dewlemend, nihayeke zindî û pêşerojeke sozdar de ji nû ve bi dest dixe.

Ev nerîn xwedîderketina kolektîf a bajêr piştrast dike û bang li kur û keçên wê, hem li welêt û hem jî li derveyî welêt, herwiha hemî evîndar û niştecihên Qanişlo dike ku pîrozbahiya vê sedsalê veguherînin tevgereke çandî û civakî ya berfireh ku rêzgirtinê ji bo hemî çandên vî bajarî vedigerîne.

Serkeftina pîrozbahiya sedsaliya Qamîşlo bi asta beşdariya gel ve girêdayî ye. Ji ber vê yekê, em bang li her kesî dikin - kes, saziyên sivîl, siyasî, civakî û olî, hem fermî û hem jî nefermî – ku bi awayekî kesane an jî bi hev re beşdar bibin.

## Rêxistinên îmze kirinê

1- Komeleya Çandî ya Suryanî li Sûriyeyê

2- Komeleya Keziyên Kesk a Jingehî

3- Komeleya Şawêşka

4- Komeleya Warşîn ya jîngehî

5- Kombenda Hevdestî ji bo Qurbaniyan

6- Navenda Aso ya Şêwirmendî û Lêkolînên Stratejîk

7- Însîyatîfên Jinan

8- Ronî Peywend

9- Rêxistina Artîst ji bo Çand û geşepêdanê

10- Rêxistina Aştî

11- Rêxistina PÊL- Civil Waves

12- Rêxistina Dîmos

13- Rêxistina HDC

14- Rêxistina Malva ji bo Huner û Çandê

15- Rêxistina Nextep

16- Rêxistina Smart ji bo Pêşxistina Civakê

17- Rêxistina Sûriyê ji bo Rastî û Dadmendiyê

18- Rêxistina Şar ji bo Pêşkeftinê

19- Rêxistina Tedmirto ji bo geşepêdan û Hevgirtina Civakî

20- Rêxistina White Hope